

JI BO KED, AŞTÎ Û DEMOKRASIYÊ BER BI BERXWEDANA YEKBÛYÎ!

Hêzên ked, aşti û demokrasiyê di bin zext û zordarî û dorpêçkirinê de ne. Maf û azadiyên sendîqayî tên şêlandin. Grev tên qedexekirin. Kedkarên civakê, bi vepirsînên der hiqûqê, ji kar tên bidûrxistin yan jî tên sirgûnkirin. Karkerên jin, bi zagona torbeyê, di malan de tên hiştin. Her meh kêm zêde 150 kedkar, di kujarên kar de tên qirkirin.

Li hêlekê, bajar, bi tanq û topan tên wêrankirin, bi sedan hemwelatîyên sivil tên qetilkirin, bi sed hezaran mirov tên koçberkirin. Li hêla din, êriş li mafên kedkaran tên kirin, bêewledarî tê sepandin. Karker û kedkarên ku li dijî polîtîkayên şer û kedxwariyê derdikevin, ji karê xwe tên avêtin yan jî bi zext û zordariyan û bi gefan tên çewisandin.

Em nava van rojên ku berxwedan û têkoşîna li dijî desthilatiya Qesra AKPê bilind dibin, ber bi 1ê Gulanê ve dimeşin. Îro daxwazên ked, aşti û demokrasiyê ji berê zêdetir bi hev ve girêdayî ne. Em ê bibin yek û bi vî awayî em ê li dijî êrişên pergali derkevin, yên ku li azadî û kedê, li gelan û li siberoja me tên kirin. Em dikarin li hember kedwariya qapîtalîzmê û hewesên dîktatoriyê, jiyanê mirovane bi berxwedanê bi dest bixin!

Ji bo ked, aşti û demokrasiyê, ji bo mezinkirina berxwedanê û ji bo piştevaniya kedkaran, banga me li hemî kedkar û karkeran e!
Em ê li dijî şer aştiyê, li dijî faşîzmê demokrasiyê, heta dawîya dawîn biparêzin!

Em ê berxwedanê geş bikin û em ê bi têkoşîneke yekbûyî bi ser bikevin!

“Di Roja Yekîtiyê, Piştevaniyê û Têkoşînê ya 1ê Gulanê de”

- Ji bo têkbirina bêewlehiyê,
- Ji bo pêşî li zagonên bindestiyê bigirin,
- Ji bo taşeron bê rakirin,
- Ji bo dijderketina qaspkirina qidemê,
- Ji bo dijderketina qaspkirina mafên qidemê
- Ji bo girtina zêdehiya bacê
- Ji bo parastina ewlekariya karkerên giştî
- Ji bo derfet û mişeyên însanî û ewlekariya kar
- Ji bo derfeta venêrîna ewlekarî û tendurîstiya karkeran ji sendîqayan re bê vekirin,
- Ji bo parastina ked û azadiya jinan,
- Ji bo ku dawî li karkeriya zarokan hînin,

Bijî 1ê Gulanê!

1 EM Ê LI DUÎ ŞER,
WÊRANKIRIN Û
BİNDESTIYÊ, LI
Ê BER XWE BIDIN.
GULANÊ



BIJÎ YEKÊ GULANÊ

1 EM Ê LI DUÎ ŞER,
WÊRANKIRIN Û
BİNDESTIYÊ, LI
BER XWE BIDIN.
GULANÊ



BIJÎ YEKÊ GULANÊ

TEM Ê LI DUÎ ŞER,
WÊRANKIRIN Û
BINDESTIYÊ, LI
BER XWE BIDIN.
GULANÊ



BIJÎ YEKÊ GULANÊ

TÊ EM Ê LI DUÎ ŞER,
WÊRANKIRIN Û
BINDESTIYÊ, LI
BER XWE BIDIN.
GULANÊ



BIJÎ YEKÊ GULANÊ